***Dumahîk : Newrozname***

*Guhdarên xoşewîst û birêz !*

Nemir Nuerdîn Zaza , di danîna kevirê bingehîn di avahiya kurdbaweriyê de , xwedî roleke têbînkêş bû, tu kes nikare bibêje û rola wî tune û bincil bike . Li vacayî vê yekê kes , part , dezgehên nirxa mirovên mîna D.r Nuridîn Zaza bigirin gelek in . Me ji hêla xwe ve , weke malbata weşan a Nweroz , nirxa pakrewanê zindî (N.Z), ji roja roj ve baş naskiribû . Herweha , me di civata pêşîn , ji ya derçûna Newrozê de , biriyar wergirt ku, du wêneyên herdu stêrkên geş D.r (N.Z) û apo Osman Sebirî , di sînga weşana me Newroz de hildan û wewke nîşan ji xwe û xwendevanan re venan . *Gelî xoşewît û birêzan*

Li dawiya Buhara sal 1994an , cvîna derçûnê , ji weşana Newroz re hate girêdan . Tê de , biriyara weşana duheyvnameyî Newroz û bi zimanê Kurdî me wergirt. Ji wa rojê ve û ta ev roj , her du mehan hejmarek , li dû hevdu û bi rêk – pêk stêrka geş D.r(N.Z) bi bîra me dihate. Me jî , ji carekê pirtir , gotina D.r (N.Z) bi bîra dihanî û diweşand:

**((Gelî Kurdan ! Eger hûn dixwazin tar – mar û winda nebin . Ji berî her tiştî , zimanê xwe bixwînin û bidine xwedin . Gelî Kurdan ! Eger hûn dixwazin xwe nasbikin û bi xelkên derdora xwe bidine naskirin ; dîsan jî , zimanê xwe bixwînin û bidine xwendin** ..)).

Wisan jî , li ser riya dûr û dirêj , riya xebitandina peyv û nivîsandina bi zimanê Kurdî , zimanê D.r (N.Z) , me weke komîte , (63) hejmar ji Newrozê weşandin û ya ( 64) an jî , li rê ye . Di ber vê re , me weke komîte , bi pend û şîretên nemirê me yê hêja D.r( N.Z ) baş girtibû. Me ziman dixwend û dida xwendin , li hemû navçe û herêmên kurdî nemaze li bajarê Helebê , bi dehan mamostên zimanê kurdî , li ber û ser destên me perwerde bûne û hê jî dibin.

Biserbilindî û şanazî em dikarin bibêjin , ew jî ji hêlên xwe ve, zimanê kurdî dixwînin û didine xwendin .

Li dawî , em dixwazin ji hemû guhdar û xwendevanan re bibêjin ku , D.r ( N.Z ) nemirî û namire . Çêtirîn nîşan û dubat, ji vê re -li vir- komcivîna mîna vê ye

**Sipas ji baş guhdariya we re . Komîta Newroz:3/9/2005an**

**********

## Dumahîka Birûska Nwerozê

kurdî di dil û hişên nifşên xwe yên nû de biçînin û dara wê av bidin, wan fêrî zimanê dayika wan bikin, wan fêrî hezkirin û rêzgirtina hev bikin, ji ber ko mezinên me gotine:" Hezkirina ziman ji hezkirina welêt e ..."

Bera destên we sax be birano, em mezinên xwe ji bîr nekin, mêjûya gelê xwe bi reşî û ronakên wê ve ji bîr nekin, jê sûde bigrin, ji ber ko, yê mêjûya wî tune be, paşeroja wî jî tune ye, û em hemî bi hev re, ji bo çand, tore û zimanê kurdî mil li mil kar û xebatê bikin.

Sed silav bo giyanê seydayê nemir Cigerxwîn.

Sed silav bo giyanê hemî rewşenbîrên me yên temenê xwe di ber, hebûn, ziman û doza gelê xwe de winda kirine.

Û sipas bo we hemiyan

**Komîta NEWROZê 22-10-2005**